# azadî

**SİYASET • MARKSÎZM • ÇAND**



*ji azadî û serxwebûnê birûmettir tiştek nîn e. ( Ho Chi Minh )*

hejmar 1 tirmeh 1978

# azadî, azadî !

Sedsala bîstan di çaryeka xwe ya dawîn de ye.Gelên(xelkên)bindest yeko yeko gihan azadiya xwe ya siyasî,dewletên xwe çê kirin,jiyana xwe ya neteweyî(millî) ava dikin;hin ji wan xwe li riya rizgariya(xelasiya) aborî(ekonomîk)girtine,

Rûçikê cihanê di van bîst salên borî gelek guherî,gavekî mezin ber bi rizgariya temamî hate avêtin.

Ev kêfrat,ev şer û têkoşîn,ev bayê azadiyê xelkên hûrik,ên ku hejmara wan di dora çend sedhezarî de ne,jî şiyar kir,rakir piya.Ew jî doza azadiya xwe dikin.Di vê demê de,neteweyekî(milletekî)bîst milyon hê ji mafên(heqên)miroviyên hîmî marûm e,bêpar e.Hê ew per çekirî ye,bê jiyana(heyata) xwe ya xas û arizî ye;hê wek dîl û kolan hebûna xwe ne daye qebûl kirinê;hê nikare bi serbestî bi zmanê xwe jî bixwîne,binivîse:Neteweyê Kurd!bi hej mara xwe mezintirîn civaka koleya cihanê !

Ji sed û pêncî sê dewletên dinê,tenê nifûsê sih û duyan ji yê Kurdan bêtir e.Neteweyê Kurd bindest e,nezan e, perçiqandî ye.AZADI ji bo vî neteweyê dîl û bindest !

Di vê dawiya sedsala bîstan de piraniya gundên Kurdistanê hê di Heymana Navîn de dijîn.Axa û beg hene, xwedîmilk in;xwediyê çend gundan e.Gundî hê wekî dema Hamûrabî ji wan re dehyekî (eşere) û bêşa didin suxra wan dikin;wekî kola di bin nîrê wan de nûzenûz in;bi gund û erdan ve tên kirîn û firotan.Gava ku li qîma wî nayê,xwedîgund bêsedem û bêpirs bert wan dide,wan ji zevî û xweliya ku bi salan xweydana wan ve xwariye,pê dewlemend û bibîn û bereket bû ye,davêje,dûr dike.

Li bajêran,bi sed hezaran betal,karker û xebatkarên kuxeynî keda xwe û hêza xwe ya xebatê xwediyê tiştekî nîn,ji aliyê sermayedar,têcirên gir û bazirgan,talanker û kedxurên her rengî tên şêlandin, perîşan û şerpezekirin.Şêx û mela van girse(cemahir,kitle) yên bindest,belengaz û nî-birçî bi xewnên mîstîkên tewşdilorînin,dixapînin;wan serde bi agirê dojehê(canimê) ditirsîs nin;wan ditevzînin û gêj dikin.Bi vî awayî pariyê xwe di donê şêlandinê dadikin ebûra xwe dikin.Ev tebeqeyên serdestên kurd bûne aletên perçiqandin û şêlandina gelê kurd;ew maşik in di destên neyarên me de.Ew asêyî û kelem in li ser riya rizgariya xebatkarên kurd. AZADI jibo xebatkar û cotkarên Kurdistanê!

Jinên Kurd,ku di demên borî de serbest bûn,heval û hempayê mêra bûn,niha,di bin tesîra dîn û kevneperestiyê,ketine rengê kole û girtiya,ji jiyana xwe di nav çar dîwaran de derbas dikin,ji xwendin û hîn bûnê,ji gelek warên jiyana mirovî hatine bêpar kirin,dûr kirin. Nîvê xelkê me bi vî awahî hatiye spartinê perdeyên reşahî û nezaniyê.Rizgariya wan, azadiya wan,perçeyekî hîmî yê Şoreşa Kurdistanê ye.AZADI jibo jinên Kurdistanê !

Pirsên şerê rizgariya gelê kurd pireng û pirhejmar in.Divê ew bên nivîsandin,axaftin.Li ser wan bîr û bawerî bên gotin,pêşvebirin.Çand û dîroka kurdî çêtir bê nasîn û belav kirin.Divê ku şerekî xurt bê dayîn jibo belavkirina ramanên(fikrên) şoreşger, jibo bikurdî belavkirina marksîzmê di nav rêzên welatparêzên Kurd.Kovara AZADI,ewê jibo pêkanîna van armancan şerbike:.

AZADİ ŞER E,TÊKOŞÎN E,KEFTELEFT E,ŞEREK DÛR Û DIRÊJ,DÛREDOM E.AZADÎ NAYÊ DAYÎN , NAYÊ BELAVKIRIN,NAYÊ PÊŞKÊŞKIRIN:TÊ STENDIN KES KESÎ RIZGAR NAKE,GELÊ BINDEST TENÊ BI HÊZ Û TAQETA XWE DIKARE BIXWE XWE RIZGAR KE

# Quncikê Marksîzmê

*Van demên paşî,di nav hin komik û "partî" yên ku li Tirkiyê doza sosyalîzmê dikin,zehf kesên ku nişkeva bi hebûna kurda dihisin, di xwe da reha "Xelaskarî" yê dibînin,dersên rizgariyê didin xelkekî ku ev bûn çend dehsaljibo azadiya xwe şer dike;ew dixwazin me bi çengekî xewn û wa'dan bixapînin.Hin,çepên nawendî(merkezî, wekî "pêşverû" yên CHPa Ecevit, didin pêş ku "pirsa rohelat" pirsekî aborî(ekonomîk) e,bi avakirina çend rê,pir,xwendegeh(mekteb) û kargehan ewê bê safîkirin;kî qala gelê kurd bike,ew "qedr û rûmeta Tirkiyê li derva kêm dike,nijadperest e,maşik û leyistoka emperyalîzmê ye"(!)Gewherê CHPê,borî(mazî) ya wê,felsefa wê kifş in û jixwe kes doza şoreşgeriyê li wan nake.*

*Lê gava ku li ser navê şoreşgerî û marksîzmê,hin,bêhedî,keysperestî (oportinîzma) û şovînîstiya xwe heta tehrîf kirina hîmên(esasên) bingehiyên marksîzmê dibin,di pişt xêliya "şoreşgerî" mafê(heqê) gelê kurdê xwe hevdesazîn(tenzîm) û ji rizgariya xwe ya neteweyî(millî) şer kirin inkar dikin,li dijî vî şerî dertên,divê bêrawestan,bêgidî xeliya ser çavên van neteweperest (nasyonalîst) û şovînê şermezar bê çirandin,rûçikê wan derkeve meydanê.*

*Na gelî "şoreşgerên" derewîn,yên ku ji qemçika îdeolojya birjûwazya xwe derneketine,doza gelekî bindest ne paşverûtî ye,ne leyistoka emperyalîzmê ye;ew emperyalîzma ku milê wê di milê birjûwaziya Tirkiyê,Iran,Iraq û Sûriyê de ye.*

*Ev çîrçîrokên han,hingî hatin gotin erzan bûne,riziya ne.Mebêjin, rawestin,kingê me sosyalîzmê rastkir emê jixwe mafê kurda jî bidin wan! Wa'dên 1908 û 1919-1922 hê tên bîra me.Jixwe,ev yek ji gewher û giyana marksîzmê re,ji hîmêwê re vajî ye,ters e.Çawa "birjûwaziya liberal" proletaryayê rizgar nake, neteweyekî serdest,xelkê mêtingeha (mistemlekeya) xwe rizgar nake.Ku awê we bûna,diviyabû Vietnamî û Cezayirî bêdeng û bêhis bimana ta ku li Fransayê sosyalîzm saz be!*

*Gelo tevgera marksîzmê li hemberî pirsa rizgariya gelên bindest çi ye? Di şertên niha de,divê marksîstên Kurd çi bikin?Jibo ronakiya van her du pirsan,me divê dakevin kaniyên marksîzmê,yên ku nayên şolîkirinê.Em di vê hejmarê de bendekî ku F.Engels di sala 1882a de li ser Polonyayê nivîsî ye,pêşkêşî dîna xwendevanê xwe. Tê zanîn ku di wê demê de Polonya di navbeyna Rûsya,Almanya û Awistirya hatibû parîkirin,perçebûyî û bindest bû.Wek Kurdistanê.*

**F. Engels**

## SOSYALÎZM Û RİZGARİYA NETEWEYÎ

Yek ji karên pêkên (reelên) Şoreşa 1848a (û karên pêk û ne yên xewnî û leylanî yên şoreşekî timî di dûmahîka vê şoreşê de tên helkirin)bicihkirin û rizgarîna(xelas kirina) neteweyok(milliyet) ên bindest û perçekiriyên Ewrûpa Navîn bû,qenebe yên ku dikarin bijîn û jibo serxwebûnê gihîştî ne. Ev karê han bi destê cîhanînkerên(tetbîqkarên)wesyeta şoreşê, Bonaparte,Cavour,Bismark hate pêkanîn,li gora şertên wê çaxê jibo Italya,Macaristan û Almanyayê.Diman Irlanda û Polonya.Irlanda dikare li vêder derveyî peyivê bimîne, têkiliya wê û pirsên heverdayê(kit'ayê)tenê bi awayekî neyekser e.Lêbelê Polonya di nava heverdaya Ewrûpayê de cih girtiye, parastina(midafaa)parîkirina wê timî tevgirêdanên Hevalbendiya Pîroz nû dike;lewra Polonya gelek bala me dikşîne.

**RİZGARİYA NETEWEYÎ ! RİZGARİYA CİVAKÎ !**

Jibo gelekî mezin,bi awakî dîrokî,tu pirsekî hindurî bi sergiranî(ciddiyet) minaqeşe kirin ne mimkin e taku ew ji serxwebûna (istiklala) neteweyî bêpar e.Berî 1859a,li Italyayê sosyalîzm ne dihate qalê,tew hejmara komarxwazan(cimhûriyetxwazan) jî kêm bû,her çiqas pawendên (elemanên) jêhatîtirbûn jî.Ev ji 1861 a bivirde ye ku komarxwaz zêde bûn,xwe pirîn û pêlek şûnde pawendên(elemanên) xwe yên çêtirîn derbasî sosyalîstan kirin.Li Almanyayê jî wisa ye. Lasalle dikira dev ji dozê berda,wekî ku doza wî xelet be,kîngê ji bextê xwe re hate kuştin.Tenê kingê di 1866a de yekitiya mezin-prûsî ya Almanya Piçûk hate qerar dan ku partiyên Lassallî û "Eisenach"î bûn xwedî hebûnekî berbiçav û tenê ji 1870a bivirde,ji dema ku îştahên îşxal û frehbûnên Bonaparte ji binî hilweşiyan,doz dest bi meşandinê kir.Heke hê Dieta(meclîsa) me ya kevn hebûya ewê niha Partiya me li kur bû ya?Ev jibo Macaristanê jî wisa ye.Tenê ji 1860a bi şûnde tevgera nûjen(modern)-xewn li jor,sosyalîzm li jêrxuya bû.



Tevgera navneteweyî (beynelmillel) ya proletarî tenê di nav neteweyên biserêxwe(miletên misteqîl) de mimkin e.Piça enternasyonalîzma(navneteweparêzî) komarxwaziya ku di 1830-1848an de hebû,civiya li dora Fransayê, ku diviya Ewrûpayê rizgar bike.Ev yek şovînîtiya fransizî ew çend xurt kir ku Fransa bawer kir ku rizgar kirina Gerdûnê(kaînatê) jê tê pirsîn û ev mafê(heqê) wê yê destpêkî ye ku timî li pêşiya tevgera rizgariyê be.Ev iddiayên vala û bêteşe hê jî herroj tên dikevin nav rêz û safên me li gavên me dilefin. (Bi rengekî karîkatûrî li cem Blankîstan,lê bi awakî hê gelekî tîr û berbiçav li nik Malon û hempayên wî) Di Enternasyonalê de jî ev,kêmzêde ramana (fikra)Fransizan bû. Tenê bûyer(hedîse) nîşî wan û gelekên din dan ku tevkariya navneteweyî *ancax di navbeyna wekhevan de mimkin e û ku heta "primus inter pares" (pêşekê nav wekhevan) tenê dikare jibo pêkanîna xebata hemayî (ya acîl) hebe.Ta ku Polonya perçekirî û bindest be,tu partiyekî sosylîstî xurt nikare di wî welatî bixwe de pêşve here, tu danûstendinên nav neteweyî yên berahî di nava Polonî,jibil yên derveyî welêt û partiyên proletariyên Almanyayê nikarin geş û xurt bibin.*Her gundî û karkerên poloniyê ku ji tevizandina xwe dertê û dixwaze tevî karên siyasiyên giştî bibe , berî her tiştî li hebûna bindestiya neteweyî diqelibe,asêdibe;ew asêyiya yekî ye ku li herderî derdikeve ser riya wî. Rakirina wê(asêyiyê) şertên hîmîyê(esasîyê)pêşveçûnekî aza û serxwe ye.Sosyalîstên polonî yên ku rizgariya welatên xwe nexin serê bernameya (programa) xwe,dixin bîra min sosyalîstine almanên ku wê nexwazin berî hemî tiştî jibo rabûna qanûnên awarte(istisnaî) yên dijî sosyalîsta,azadiya çapê,komelesazî û civînê şer bikin. *Jibo kefteleftê(micadelê),divê berî her tiştî zemînekî, hewa,ronahî û cîrexê(marja) tevgerê hebe.Nexwe,hemî galegal û gevezetî ye.*

Zanibin ka sazbûna Polonyayê berî şoreşa ku tê mimkin e an na,bê giringî(ehemiyet) e.Lê bi tu awayî,ev ne karê me ye ku em Poloniyan ji xebata wana jibo bidestxistina şertên jiyanî(heyatî) yên pêşveçûna wa vegerînin(averê bikin) û wan bidin bawerkirin ku ji aliyê navneteweyî,serxwebûna neteweyî karekî gelek duwemîn û ne hîmî ye, gava ku ev serxwebûn bingehê her tevkariya navneteweyî ye.

Ezdi vê baweriyê de me ku li Ewrûpayê du netewe ne tenê dikarin *lê divên beriya*

*navneteweyî(beynelmilelî)yê neteweyî (millî) bin:*Irlandî û Polonî.*Kingê ew qenc neteweyî ne,ew çêtir navneteweyî ne.*Polonî vê yekê di hemî krîzan de tê gihîştin(fam kirin) û li ser hemî zevî zevî û warên şerên de mêlag(ispat) kirin.Ku ew ji bergeha (perspektîva) avakirina Polonyayê bêpar bên hiştin û ku ew bên bawerkirin ku Polonya nû ewê di nêzîkan de pehtî bikeve devê wan,hindê ewê indî bal û hewesa wana jibo şoreşa ewrûpayî nemîne.

*F.Engels*

*Engels ji Kautsky re; nameya 7.2.1882*

*ev kerî hatiye standin ji:*Friedrich Engels Briefwechsel mit Karl Kautsky , Vienne,Danubia Verlag,1955,r.50-53

HEJMARA KU TE:
°Daxuyaniya Partiya Komunîst
°Bingehên destpêkî yên felsefeyê

NETEWEYEKÎ KU LI YEKÎ DIN ZORDESTIYÊ DIKE,BIXWE JÎ NE AZAD E!
*Karl MARX*

JIBO GELEKÎ BINDEST ENTERNASYONALÎZM XWE JI NÎRÊ EMPERYALÎZM Û ZORDESTIYA NETEWEYÎ RIZGAR KIRIN,WELATEKÎ AZA,SERXWE Û SOSYALÎST AVA KIRIN E.

XELKÊ BINDESTÊ KU ZMANÊ XWE JI BÎR NE KIRIYE WEKÎ GIRTÎYÊ KU MIFTÊN ZÎNDANA WÎ DI BERÎKA WÎ DE NE.

# ENIYA XEBATKARAN

## TEVGERA XEBATKARÊN KURD LI EWRÛPAYÊ

Rêgeha Dîrokê(tarîxê),her wekî tê zanîn ne xêzekî yekser û rast e.Carna hin fetlanek û xwarovîçkiyên wilo dikevinê ku pêşdîtina wan dijwar e.Kî,berî bîst-sih salan,bawer dikir ku ewê rojekî cotkar û karkerên Kurd dev ji nîr û gîsin,tevir û bêrên xwe berdin,werin welatên Ewrûpayê,ew Ewrûpa ku heta hingê tenê malmezin,dewlemend û begzade dikaribûn bidîtina ?

Betalî û guhêrandinên civakiyên(sosyalên) ku li Kurdistana Tirkiyê peyda bûn,hewcedariyên sanayiya welatên kapîtalîst ji 1963an bi vir de bi hezaran xebatkarên Kurd xistin ser riyên Ewrûpaya Rojava.Hejmara wan niha li dora sed hezarî ye.Ew,bi piranî,li Almanya Rojava cîwarbûne,lê li Swêd, Hollanda,Fransa,Belçîka,Danîmarka û Awistiryayê jî çend hezar karkerên me hene.

Rewşa(halê) van "koleyên nûjen"(modern) ên ku tinebûn,belengazî avêtiye nav lepên sermayedarên kedxurên ewrûpayî,newek hev e;ji dewletekî yekê din diguhere.Lê, bi awakî giştî,ji rewşa wanî welêt bêgoman zehf xweştir e,her çiqas derdên dûrî,biyanîtî(xerîbî) û şaristana giran be jî.Ew dikarin zikên xwe û malî

Bi piraniya xwe,karkerên me yên Ewrûpayê hê di bin tesîra îdeolojiya feodal , pêşinhukmên dînî û bîrûbaweriyên birjûwaziya Tirk de ne. Xwînrêjî,hovîtî û zordestiya salên 19-20-1930an çavê gelê me ew çend tirsandiye ku hêjî hinek ji wan karkerên ku ji Kurdistanê hatine û li mala xwe bi kurdî dipeyivin-piraniya wan zehf kêm tir kî dizanin-zûbizû newêrin xwe li kurdîtiyê deynin,di xofa hikûmeta tirk û polîsên wê de dijîn. Ên ku jibo "namûsê" an mirîşkekî dikarin deh Kurdên din bikujin,ji pasaporta xwe ji memûrekî tirkî pi çûk fikara dikin,ditirsin.Hinên din,her çiqas di şertên proletarî de dijî jî, xewnên dewlemendbûnê xwey dikin,ji rizgariya kesane(şexsî) hêviya xwe ne birî ne.

Ev rewşa han,di nav rêzên wan de xebatekî siyasî pêkanînê dijwar dike.Lê dîsa jî van salên dawîn li Almanya,Swêd û hin welatên din,ji serwextirîn,bizantirîn ên wan çend "komeleyên karkera" hatine sazkirinê;ew,piçûk be jî,xebatekî dikin. Hinek ji van komelan xwediyê têdeyîyeke (mahîyeteke) siyasiya qels in;wekî çayxane û dîtingeh in. Tê de carna karker li ser edetên bajar

yên xwe têrbikin,li-xwekin,zaroyên xwe bidin xwendinê.

Û gundên xwe xeber didin,xwarrin û ley stêkên wan,dîlana wan didin nasîn.Ji salê carekî Newroze kî çêdibe;karker jî xwe re gohdariya dengbêjên kurd dikin, li dîlan û govendan dinêrin.Ev gava han, ji binî tinebûnê çê tir be jî,têr nake û gelek şermok e.

Di aliyê din de komik û "partî yên ku li Kurdistanê çêbûne bi dîtinekî kurt û teng,dixwazin heryekî ji xwe re komeleya xwe ya karkeran rast kin û bi rengî, rêzên van karkerên ku hene jî perçe dikin.Hin"şoreşgerên" Tirk,li ser navê "sosyalîzmê" ferman derxistine ku nabe ku karkerên kurd biserê xwe hevdesaz(tenzîm) bin,komeleyên xwe rast kin.Bi ya wan, ev"neteweperestiya (nasyonalîzma)birjûwaziya piçûk e,leyistoka emperyalîzmê ye"(!)Maazallah! Xwedê me bistirîne! Yên ku hêjî di dûvika kemelîzmê de ne,ji pêşa birjûwaziya xwe derneketine û hê nû bi hebûna Kurdan dihisin,bi derbekî dixwazin pêşengî û seroîtiya me bikin û me "rizgar bikin"(!), ji nihave azadiya me ya hîmî nanasin:azadiya biserêxwe hevdesazî,ya çarenûsa(qedera) xwe bixwe kifşkirin!

Heta ku em bixwe nebin hêzekî(qewetekî) siyasiyê xurt û pêşverû,em azadiya xwe nestînin,kes vê azadiyê nikare,ji kerema xw re,bide me.Em ne zarûk in ku "mezinên" me,bi dilovanî û kerem,bi destên me girin,me derxin ber beroşkê tava azadiyê!

Rojên tengasî û pêsîrtengîyê,yên qirkirin û kuştinên Geliyê Zîlan,Agirî û Dêrsimê gelo "Xelaskarên" me li ku bûn? kesî dengê wan nedibihîst.Zmanê xwe daqurtandibûn ?ji bizav ketibûn?Na,hin ji wan,komînîst û pêşverûyên welatên din jî dixapandin, bê şerm û fedî li tevgera rizgariya Kurd nebû(iftira) dikirin,hovîtiya birjûwaziya xwe ya kemalîsta "pêşverû" diparastin.

Karkerên Kurdistanê! Şoreşgerên Kurd!Marksîzm her wekî zanîne kî şoresger,pêşverû malê bavê kesî nîn e, ne di yekfoya(inhisara) kesî da ye:rênîşana hemî xebatkar, belengaz û gelên bin destên cihanê ye.Bila gef(tehdîd) û for tên dengîn,çavê kesî metirsîne!

Divêyiya(wezîfa) me marksîstên Kurdistanê ew e ku em karker û cotkarên welatê xwe hevdesaz kin,têxin hêz û qewetekî siyasî,rizgariya neteweyî û civakiya gelê Kurd bidest xin.Wek Vietnamê !

Di vî warî de,yek ji şaxên xebata me ya Ewrûpayê ev e ku em karkerên Kurd bi dîtinekî fireh û bêsektarîzm,bê hesabên piçûkên rûyenga(sewiya) dikandaran;hevdesaz (tenzîm) bikin,wan peyderpey di nav Yekîtiya Xebatkarên Kurdistanê de bicivînin;serwexttir û bizantirên wan jibo pêşajoyiya Şoreşa Kurdistanê bighînin.

Divê ku em xwe ji xirecir û berberiyên beşokan(fraksiyonan) bifilitînin;divê ku darekî tu car hebûna daristanê ji ber çavên me veneşêre.

Hebûna komele û hevdesaziyên kurdayî biserê xwe ferz e, şertekî hîmî yê rizgariya gelê me ye.Ev ji me re nabe asêyî ku em di vê navê de di nav hêzên tirkên pêşverû de jî hebin, dêngê xwebidin bihîstin,neyên tecrîtbûn. Lê timî di bîra me da be kutenê *hezekî kurdî biserêxwe dikare bibe hebûnekî,bibe giraniyekî di mêzîna dîrokê de.Dîsa wekî 1908 û 1919-1922an em xwîna xwe jibo çend wa'd û leylanan nerêjin.Heta niha , me gelek caran her wekî gotinekî xelkê me dibêje "Bûka xwe daye bi tûtûk".*

*I n d î  B E S  E!*

# XEBATKARÊN HEMÛ WELATAN, GEL Û NETEWEYÊN BİNDEST YEKBİN !

# ENIYA XWENDEKARAN

## BERPIRSIYARÎYÊN BÎREWER Û XWENDEKARÊN KURDISTANÊ LI EWRÛPAYÊ

Tevgera Xwendekarên Kurdên Ewrûpayê nexweş e.Jana wê giran e:perçebûn,berberî,xirecirên piçûk û serê hemî tiştî tiralî,zexelî,bêkêrî ! Di dema ku gelê kurd di bin piyên dewletên işxalker de diperçiqe,di nalê,tê kuştin,nefî(sirgûn) û talan kirin,nêzikî sê hezar xwendekarên kurd,"zana û rênîşanên millet",tu tiştekî nakin.Ji salê carekî newrozekî,car carna belavokekî rûpelek an du(piranî bi zmanê erebî) bi gotin û formulên ku hingî hatine gotin û cardin kirin ji rûmet ketine,rengê polikekî pêncpere.

Sedemên(sebebên) vê rewşa xemgîn pirreng in,pirhejmar in;ne tenê nezanî,paşdemayîna bîrewerî(entellektuel),zihniyeta eşîretî an ji nav sinifên serdestên Kurdistanê hatin e,wekî ku carna tê gotinê . Rast e ,her wekî kesên ji nav xelkekî zehf paşdahiştî hatî, bîrewerên me li ber yên gelên din him kêm in bi hejmara xwe,him jî bi çawayiya xwe qels in,gelek paşdemayî ne.Di nav xelkekî ku hê bi piraniya xwe ya giranî nexwendewar e,yên ku xwendin û nvîsandin dizanin,xwe "ullemayê esir" dizanin,bi çavên kahîn û fêlbazê eşîrê li xwe dinêrin,wekî melayên duwanzde ilm,ji wanştirê ku bi her tiştî dizanin û hewcedarîya xwendinê,hînbûnê, pêşveçûnê,xwe nûkirinê di xwe de nabînin.Li cîkî weka Ewrûpayê ku imkanên hîn bûn û nasiyê bêhed û bêhesab in,wextê xwe bi galegalênpûç û beredayîyê derbas dikin bi hevra ji bo tiştên ne tişt,yên ku qalikê gûzekî tejî nakin,dikevin qayişê,gora hevûdin dikolin.Bi vî rengî,piştî çend salan ji Ewrûpayê dest û serî vala vedigerin..Çû sefefê hat dîsa ..Vê gotina xelkê bêsedem ne hatiye gotin.

Hin ji van kesan,ku bi nezaniya xwe ve jî tekemeke(teredut) nekirine,berpirsiyariyekî giranê wekî serokîtiya tevgerarizgariyê dane ser milên xwe. Lewre jî bi saya dûrdîtina(!) wan tevgera gelê kurd li Iraqê wekî qesrekî ku li ser qûmê avabûyî,bi derbekî hilweşiya.Pêşiyê me gotine:Malxweyê me Om e,xwelî li serê me kom e!"Piştî vê sosreta giran û cirmên xwe, ev merivên ku li welatekî pêşdeçûyî kes ewê neke keyayê gundekî,hê ji kêrta xwe neketine;hê doza meznahî û pêşajoyiya tevgera kurd dikin.

Ya rastî,ev nexweşîn û kêmasî ne tenê para Kurdan,lê ya gelek xelkên CihanaSisiyan in.Lêbelê cihêbûn ev e ku şert li ciyê din wisa ne ku çend bîrewerên dirist,soreşger û zana dikarin tevgera xelkê xwe têxin ser riyekî pêşverû û wî bighînin serfirazî û rizgariyê.Li Kurdistanê,di serê ku li dijî çar dewlet û piştegirên wan tê ajotin, şert gelek zor û dijwartir in;em hewceyê gelek şoreşgerên zana dirist û fedekar in. Bê van kadran(kadroyan) şer tê kirin(ji aliyê şer ve,gelê me timî jêhatî bû ye), lê şoreş nabe.Şer jî, wekî ku tevgera Barzanî nîşan da jibo cara çendan,zû an de reng dişkê.Wekokên(mîsalên) vê yekê zehf in,hin ji wan di bîra me hemiyan de ne.

Di warê gihandina şoreşgeran,komeleyekî pêşverû li Ewrûpayê dikaribû xebatekî mezin pêkbîne.Li Ewrûpayê,em dîsa cardin bikin,imkanên xwendin hînbûn,dîtin,civîn , serpêhatiyên(cêribandinên) gelên din nasîn,çap û weşanê(neşrê) pir in.Jê heta niha gelek kêm hatiye istîfadekirin.
Komela Xwendekarên Kurd li Ewrûpa(KXKE) ku di sala 1956 bi xebata Dr.N. Zaza bi 18 kesanli Wiesbadenê ha

# ENÎYA XWENDEKARAN

tibû danînê,çend salê pêşîn li gora şertên hingê karekî pak û berbiçav pêkanî.Di wê demê de hebûn û yekîtiya komeleyekî Xwendekarên Kurdistanê bi xwe,xweyîmana bû,giring(mihîm) bû.Piştre,nemaze(bilhassa)ji 1963an de bi şûnde, KXKE bû cîgehê şer û berberiya Kurdên Iraqê.Ji 1963an heta 1968an di destên hevalên Telebanî,ji 1968a bişûnde jî di destên piştegirên PDKa Barzanî de bûn leyistokekî.Wekok:Kesekî ku berê qet ne endamê komelê bû jî,ji ber ku birayê wî xulamê Idrîs Barzanî bû,bi emrê "jorê" dibû serekê KXKE ê!Bê jiyana demokratîk,dibin emrên ji "jor dahatî",komeleyekî folklorî.Wekî her hebûnê ku kîngê xwe nû neke,pêşveneçe paşde dimîne,dirize , ew jî riziya,hilweşî.

Ji sala 1965an bişûn de KXKE laşekî bê giyan(ruh) e,term e.Hênavê wê,bi saya diravê(perê)PDKa Iraqê mabe jî,ew bi xwe îndî ne tu tiştek e.Em ne bawer in ku piştî ev qas tiştên qewimî hê merivên "saf" hebin ku dikaribin bawerkin rojekî wê islah bikin,vejînin. KXKE îndî leyistoka mîratxur û wêrisên Barzanî ye.Li wan pîroz be!Zû an dereng ewê jî bikeve rêza KAJIK a Cemal Nebez. Tê de ciyê tu xortê pêşverû şoreşger tune ye.

Herçî AKSA,ku emê di hejmara xwe ya ku tê li serê dûr û dirêj bimînin,têde gelek endamên pêşverû hebin jî bi awakî giştî,hê di dûva Yekîtiya Niştimanî ya Telebanî de ye;pê tê dileyzîn.Komeleyekî pirtexlît û bêahang e,cîgehên dijheviyên(tezadên) xurt e.Endamên pêşverû di şoreşa kurdên Iraqê de jî hebûn;pirsa hîmî(esasî) ev e:serokîtî di destên kî de ye?Heta ku di nav destên hevalbendên Telebanî de be,di nav rêzên AKSAyê de xebatekî pêşverû û şoreşger kirin ne mimkin e.

Ji ber vê yekê em ji xwendekarên kurd ên şoreşger re dibêjin: wextê xwe bi pevçûn û xirecirên bêhêvî,bi xewnên islahkirin a komeleyên ku nayên edilandin ne dêrizînin,israf nekin.Ciyê ku hejmara we dest dide hun çend kes bin jî,ji xwe re komeleyekî şoreşger çê kin ku têde aheng,nêzikahiya bîrûbawerî hebe; têde kar bê kirin.Ku ev jî ne mimkin be,giraniya xwe bidin karê hevdesaziya(tenzîma) karkerên kurdên welatê ku hun lê dimînin. Komelekî merivên bawerîxurt,fedekar,şoreşger,ahengdar,endamên wê kêmbin jî, ji komeleyên bêgiyan,leyistoka hêzên bidervegirêdayî hezar caran çêtir e. Kîngê çend komeleyên pêşverû,weke ya Fransayê,li welatên din jî çêbûn,hindê ewê dikaribin hêzên xwe bighînin hev û ji xwe re yekîtiyekî têkûz,domdar bi bingeh,konfederasyonekî demokratîk çêkin. Ev e ARMANCA xwendekarên şoreşgerên Kurd li Ewrûpayê !

Hejmara ku tê:
PIRSA AKSA YÊ




**TÊKOŞÎN HETA RİZGARİYÊ !**

# JÎ DÎROKA KURDİSTANÊ

Di adara 1975a,gava ku tevgera çekdara (bisîleha) Kurdên Iraqê şikest,rojnamevan û nêrevanekî(mişahîdekî) siyasivî biyanî(ecnebî) evan gotina nvîsî:"Kû Kurd dîroka(tarîxa) xwe zanibûna ev çend sosret û mûsîbet nedihatin serê wan.Tiştên ku van rojan derbas dibin kêm-zêde di serxwerabûna(isyana) çiyayê Agirî(Ararat) de jî qewimîbûn."

em dikarin bêjin ku dirûvê serhilanîna dûredirêja di bin serokitiya Şêx Ubeydillahê Nehrî jî dida vê tevgera hana ku Barzanî serî dikişand,wekî du dilopên avê,her çiqas şertên siyasîyên derveyê 1880an û yên 1975a,şertên hinduriyên çivaka kudayî hingê û ya niha ji hev cihê bin ji hev dûr bin jî.

Belê rast e:Kurd dîroka xwe nizanin.Ev dîrok bi piraniya xwe hê ji tariyên şeva Heyama Navîn derneketiye.Dewletên ku dest danîne ser Kurdistana me rola şoreşger û hişyarkera dîrokê çendî rind dizanin ku,bi hemî hêza(qeweta) xwe dixwazin wê bidin windakirin,fetisîn.Koleyê ku bibîr tîne,xwedî bîra dîrokî ye,sibê serî hiltîne,doza azadiya xwe dike.*Bîr dijminê zorkariyê ye* Lewra ew wisa bikelûbîn dixebitin jibo vekuştina bîra me ya hevrayî(mişterek),bîra me ye dîrokî,ya dîroka şer û şoreşên Kurdistanê.

Dîrok neyarê koledarî,xulamîtî û mêtina gehparêzîyê(kolonyalîzmê) ye.Di cîkîde,çînên(sinifên) serdestên Tirkiyê , Iran,Iraq û Sûriyê, ku vê rastiya hîmî dinasin,pergala(nîzama) xwe,kâra xwe diparêzin(midafea dikin),naxwazin vî çekê rizgariyê têxin nav destên bindestan.Diviyabû ku bîrewerên(entellektuelên) Kurd xwe bidana ava û rizgar kirina dîroka Kurdistanê.Lê kela dewlemendbûn,sermayecivîn,hewesa navûdeng jana meznahî,geleka ji van "tiştikên piçûk" dûr xistive.

Gelo nasiya Dîroka Kurdistanê di çi rewşê de ye?Kanivên zanîna wê kîjan in? Li ser dîroka kevnare,ya Med û Kardûxa xebata arkeolog û dîriknvîsên ewrûpayî zehf dîdeman kişandiye rûyê rojê, lê hê jî di vê avahiyê de qul û valahiyên kûr hene.Hê gelek kolanên arkeolojîk,lerêxistin û bikaranîn û şîrovekirina(tefsîra)bermayeyên demên borî divên.

Li ser jiyan û dîroka dewletên kurdayî Şeddadî(951-1174)yê Gêncê,Hesnewî(959-1015)kêm tişt tên zanîn ji derveyî bin geryanî(tetqîq) yên Seydayê Minorskî,zanayê ûrisê ku li ser dîroka kurdan xebatekî hêja pêkaniye.Dewleta Merwanî(990-1096) yên ku serbajarê wan Diyarbekr bû,bi saya nvîsarên Ibn ul Ezrakê Farqînî piçek çêtir naskirî ye.Heyama Silahedînê Eyûbî û malbata wî,heye ku yek ji pelên dîroka me ye ku çêtir ronak bûye,nas e.Nvîsar û gernameyên xaçperestên hem demê wî,wisa jî yên dîroknvîsên misilman vê nasînê hêsatir(rehettir) kirine.

Ji sedsala XVan bişûn de rêwî û gerok bêtir peyda dibin li Kurdistanê;li ser jiyana gelê kurd,li ser sîstema eşîra,li ser edetên mîr û mîrek û begên Kurdan, li ser jiyana wanî çandî û şehrezayiya (medeniyeta) wan,di bîranîn û gernameyên xwe de nvîsîne.Ji wa navê Ewliya Çelebî (s XVIIa),J.B.Tavernier(s XVIIa),Niebuhr(s XVIIIa),Garzoni(s XVIIIa) ji kesên xwenda û zana vêhatine nasîn;lê gelo kî yên din,Della Valle(s XVIIa),Thevenot (s XVIIa),Poullet(s XVIIa),Volney(s XVIII a),Cholet(s XVIIIa), Fraser(s XIXa),Hayne (s XVIIIa),Kinner( s XVIIIa),Rich(sXIXa), Dittel(s XIXa),Averyanof(s XIXa)hwd..hwd...bihîstiye?Nasîna şahidiya van nêrevana(mişahida) dikare bin keriyên dîroka Kurdistana feodal,nemaze(bilhassa) bûye-

**SERFİRAZÎ YA GELÊN BİNDEST E!**

# JI DÎROKA KURDISTANÊ

rên ku piştî mirina zana û dîroknîsê me yî navdar Şerefxanê Bedlîsî(s XVIa)qewimîne,dîroka "dewlet" û mîrîtiyên kurdên biserxwe ku heta nîveka sedsala XIXan domkirine(Bedlîs,Hekarî,Bohtan,Soran,) derxin ronahiyê.

Di sedsala XIXan de nemînendeyên(temsîl karên) dewletên emperyalîst dikevîn Kurdistanê;vira wêda qonsilxaneya vedikin, din perdeya tirh(proje)ên "ekonomîk"(Komisyona Chesney jibo avakirina hesinrêya Bexdayê) an "zanistî" li çar aliyên welatê Kurda digerin.Rapor û nvîsandinên ku wan ji hikûmetên xwe re şandine îro di arşîvên Ingilistan,Amerîka,Sovyetistan,Fransa û Elmanya de ne.Eşkere bûne.Pirhejmar in.Bikaranîna wan dikare quncikekî xêlî yê ji ser dîroka me ya sed û pêncî salên dawî hilîne.

Ev sed û pêncî salên han yên şer û têkoşîn in jibo azadiya Kurdistanê.Şerên gira-,bêgidî li hember siltan û şahên xwînxwar,li dijî stem û zordestiya wan,jibo avakirina Kurdistanekî biserêxwe.Di van şeran de gelê me bi mêrxasiyekî mezin şer kiriye,pirî caran di warê şer de neşikiya ye,lê hatiye dek û dolabên siyasî yên Osmanî û Iraniyan,yê pêgirtî û piştegirên wan ên ingilîz,rûs , elman,hwd..,bûye gorîya kêmasî û nezanî yên serokitiya feodal,hêvotina(idara) bê bingeh(prensîb) , berberî û xirecirên nav beg û mîrekan;tevgera xelkê ji serfirazîyê bêpar hiştine,kîrine marê nîv-kuştî.

Qenc nasîna van rûpelên dîroka me ya nêzik jibo hemû şoreşgerên kurd ferz e,divîyayîyeke pêşîn e.Di vî warî de emê her hejmar li ser serxwerabûnên Kurdan bend binivîsin,şahidiya rêwî û gerokan,agahwerên(dokumanên)arşîva biweşînin(neşir kin), ronahiyeke piralî ba vêjin ser bûyerên dîroka Kurdistanê.Di vî karê girîng da,tevkariya hemî heval û dilxwazan bixêr hatiye!

---

*Di hejmara ku tê :*

*°Rewşa siyasiya Kurdistanê:ji Çaldiranê heta destpêka sedsala XIX an*

*°Geroko Tirk Ewliya Çelebî salixê Qesra Evdal Xan,Mîrê Bedlîsê dide.*

## RIZGARIYA JINAN

milk difroşin kesekî ku dikaribe qelenekî giran bide wan;pirî caran bê dilê keçika ku ewê jiyana xwe bi wî kesê nenas re derbas bike.Carna ji xwe qet kes jê tiştekî na pirse,pê naşêwire.

Ji van çend rêzên ha dixuye ku pirsên rizgariya jinan zehf in. Emê di her hejmarê de li ser biseknin.Bila keç û jinên Kurdistanê Azadî'yê kovara xwe bizanibin.Emê bi weşandina(neşra) bend (meqale),bîranîn û serpêhatiyên wan gelek dilxweş û şa bibin.Tevkariya wan ji xwe diviyayîyekî hîmî ye.Mêr nikarin jinan rızgar bikın. Mêr û jin,di şerê hevrayî,di nav pêtîyên şoreşê de dipijin,digihên,xwe rizgar dikin.

*binhêre *F.Engels, Origine de la famille(Jêzaya Malbatê),Ed,Sociales Paris,r.72*

# Hindik - Rindik

- -Dest hilanîn fereca xêrê ye .
- -Dilê tirsonek sînga gewr nabîne.
- -Bi xweziyan dest nagihê baqên keziyan.
- -Heta mirinê çav li kirinê.
- -Ku şev reş be tu reştir be.
- -Giya li bin kevira namîne.
- -Yê ku dest dike,dê û bav nake.
- -Şêr şêr e,çi jin e çi mêr e.
- -Şêr bi dest û lepê xwe,şêx Hadî nayê hewara te.*(Meteloka Ezîdiya)*
- -Çiya nîn e ku rê pênekeve

# Rizgariya Jînan

Yek ji pirsên ferz-tir,girîngtir(mihîm tir) ê Şoreşa Kurdî stanê pirsa rizgarî ya jinan e.Jin nîve xelkê me ne.Bê tevî bûna(iştiraka) wan şer çêdibe,lê tu şo reşekî civakî(sosyal) çênabe,tu guherandi nên hîmî nayê pêka-nîn.

Hozanekî navdar di-bêje ku hun dixwazin hîn bibin civakekî , xelkekî çiqas pêşve-çûyî û şehreza(mede-nî) ye,li dereca ser bestbûna jinên wê bî nêrin.Azadî tevayîyek e.Di civaka aza de jin jî,mêr jî zaro jî serbest û aza ne.Ku yek ji wan ne aza be, ku jin bindestê mêr be,hindê her du jî ne aza ne.Ji ber ko çavsorî,zordestî me-rivan ji mirovîtiyê derdixin,dûr dixin, dikin hov û hirhop. Marks dibêje yê ku li yekî din zordes-tiyê dike bixwe jî ne aza ye!

Xortekî,bîrewerekî (entellektuelekî) çi qas xwediyê ramanên pêşerû dibe bilabi-be,ku li malawî li hemberî pîrekî wî , tevgera wî wekî ya axa an kardarekî be, ku danûsatanên wî û jina wî ne yên du hevalan lê yên ser-dest û bindest a be, ew kes şoreşgerekî "kitêbî" ye,di nefsa xwe de şoreş nekiri-ye,tiştê ku bidev di bê di jiyana xwe de bicih nayne.Girêdana wî ya şoreşgerî ben-dekî qewî û xurt nîn e:di tengasî û pêşîr tengîyan de diqurufe, diqete.Xêliya pêşve-rûtiyê dikeve,kurmê wî,xwezaya(tebîeta) wî ya kevneperest , derdikeve rûyê rojê, nexweşîn û ihtirasên wî dikarin,heke ku piçek karîn(iktidar) an berpirsiyarî bike ve destên wî,zerar û ziyanine giran bighî nin şoreşê."TIŞTÊ KU DIBÊJI DI JIYANA XWE DE BICIH BINE!"Şoreş gerê ku vê bingehê (prensîbê) pêkneyne, têkoşerekî nîvcû ye. Gotina pêşiya ye:nîv hekîm meriv ji can dikin,nîv mele meriv ji dî û îman dikin".

Jin ne tenê di civa ka me de lê wisa jî di heyama feodalîz-mê li Ewrûpa û jibil (xeynî) çend eşîr û gelokên destpêkî(ip-tidaî) li hemî dinya yê bindest mabûn û hê jî li pirî ciyan bindest in.Wekî meri vekî nayên hesabki-rin,mafên(heqên) wan ên siyasî,civakî,abo rî(ekonomîk) ji yên mêran kêmtir in.Li malê ne tenê kevanî û qewraş in,gelek ji wan serde stem(zulm) û qehra mêran dikşî-nin.Mêr kêla tade,ne heqî û zordestiya ku li derve li wan tê kirin dixwazin di se rê wan de birêjînin. Lewra F.Engels dibê-je:"Heçî li malê,mêr burjûwa ye,jin jî şû na proleter digire"*

Li welatên şehreza û pêşveçûyî,jin bi şe-rê xwe gelek mafan (heqan) bidest xisti ne û rewşa xwe edîlan dine.Lê li Kurdistanê me guherandinekî ters çêbûye.Berî sih-çil salan,dema ku jiyana eşîrî hê xurt bû,di nav koçerên kurd de jin çibigre hempa û wekhevê mêr bû;di ka rên eşîrê de wê jî raya xwe digot,gelek caran diketin nav şer û serekitiya e-şîrê dikirin(Perîxan, Edûle Xanim,hwd..)Ew bê xêlî,pûşî û çar-şev bûn.Dîlan û gov-end tevlihev bûn.Jina xwe ji mêran ne dida alî,venedişart.

Van demên dawî,bi pêş veçûna jiyana bajaran rewşa(halê) jinan xe-rabtir bû.Bajarên me, nemaze(bilhassa) yên piçûk,cîgehên taasub û kevneperestiyê ne. di bin tesîra dîn de û jiber ku bajarvanî hemî hev û din nasna kin(tu kî nas nekî jê ditirsî an fikara di-kî) û bihev itbarî(i-timad) nakin,jinên ba jêr wekî yên Erebistanê ketine bin xêlî,pûşî û çarşevên reş,xwe ji roniyê û ji meriva vedişêrin.Herwekî ka-rê jinê îndî tenê ka-rê malê ye,ew ji xwe rengê girtiyekî qet ji malê ,ji nav çend dûwaran dernayê.Hê bav hene ku keçên xwe nadin xwendin.Hin ke-çên xwe wekî mal û

*(dûmahîk rûpel 10)*

Di quncikê *Deng û Alan* de ewê her hejmar agahdarî(enformasyon) yên giştî li ser pirtûk (kitêb),sêlik(plak) û bendên nûderketî û,caran li ser ên din jî,bên dayîn.

PIRTÛKÊN NÛ

-Les Kurdes et le Kurdistan *(Kurd û Kurdistan):G.Chaliand, A.R.Ghassemlou,Kendal,M.Nazdar A.Roosevelt,I.C.Vanly*

*Pêşgotina prof. M. RODINSON F.Maspero,Paris,1978;352r;65FF*

-Şekirê Xudo;Problema natsiyonalnoy avtonomii kurdskogo naroda v Irakskoy Respublike(rûsî) *(Pirsiyara Xwegeriya-otonomiya-neteweyiya xelkê kurd li komara iraqê);teza doktoriya zana û dîroknvîsê me yî hêja Şekiroyê Xudo,endamê bêşa kurdî ya Akademiya Zanistî ya Ermenîstanê Moskva;1978*

-Prof. Heciyê Cindî;Şaxên eposa "Rustemê Zalê" kurdî.(bi kurdî) *Erîwan,1978*

-Prof. Qanadê Kurdo;Gramatika Kurdskogo yazîka(bi rûsî) *(Rêzmana zmanê kurdî ) Xebateke teze û hêja yî zana yê me yî navdar Kurdo,sermiyanê Instîtûta Rohelatnasîyê ya Leningradê,li ser her du zaravên kurdî yên hîmî:kurmancî û soranî. Moskva,1978*

LENÎN DIBÊJE :

ÇAWA MIROVATÎ NIKARE BIGIHÊ WINDARÛNA SINIFAN(CÎNAN) BÊY GEHÎNEKA(SAFHA) DERBASÎ YA DÎKTATORI YA SINIFA BINDEST,WISA JÎ EW NIKARE BIGIHÊ TEVHEVIYA NAYEREVÎN (MIOEDER) A NETEWEYAN(MILLETAN ) TA KU EW DEMA DERBASOKA RIZGARÎ YA TEMAMIYA HEMÎ NETEWEYÊN BINDEST AZADIYA XWE YA CIHÊBÛN Û VEQETANDINÊ BIDEST NEXIN.

*Oeuvres(Afirandin),c.22,r.159*

JI BIRAYÊN ME YÊN KURD RE

Komela me di payiza 1976an de hate danîn jibo ku karker û xwendekarên Kurdên ku ji ber sedemên aborî(ekonomîk) û siyasî dev ji welatê xwe berdane,hatine derve, di nav yekitiyekî de bicivîne,keftelefta(micadela) me bi imkanên derveyî welêt,di bin banê Komela Karkerên Kurd li Swêdê bide ajotin ; pirsên civakî(sosyal) û çandîyên cihêrengên(mixtelîfên)karker û xwendekaran helbike.

Herwekî tê zanîn,Tirkiye di van demên dawîn de ketiye bêborekî civakî û siyasî.Emperyalîzm rojbiroj iflas dike.Hêzên serdestên Tirkiyê jibo domdariya serdestiya xwe her cûre hovîtiyê dikin.Rojbiroj,zor - destî,stem û kedxuriya ku li Tirkiyê û li perçeyê Kurdistanê ku di bin işxala Tirkiyê de ye,dijîn qor bi qor zêde dibe.Li hevdesazî(tenzîm) û organên çepê yên ku jibo rizgariya xelkê me şer dikin,zorkariyên faşistî tê kirin.Kovara Rizgarî ku ji 1976a bivirde bi zmanê kurdî û tirkî dertê û kovara Roja Welat ku ji îlona 1977an bivirde bi her du zmanan derdikeve di nav lepên vê zordestiyê de ne.Ev zor û stema han ji qanûnên wan re, ji peymanên navneteweyî(beynelmillel) yên ku erêkirine re jî çewt û ters dikevin.


Armanca me ev e ku em brayên me yên Kurdên ku li Swêdê dimînin bicivînin bê nexweşînên ku niha li Tirkiyê belav bûne,jibo qirkirina van nexweşînan,anqo(yanî) jibo nêzikbûn û yekitiya hêzên welatparêz bixebitin.Em vê nexweşiyê pirsekî acîl dizanin û keftelefta jibo rakişandina rehên wê ji xwe re arman cekî hîmî hesab dikin.

Divê em,her wekî Komela Karkerên Kurdên Swêdê,jibo safîkirina van pirsan û pêkanîna armancên xwe,hevalên Kurd ber bi yekîtiyê herin û bi dilxurtî şerê xwe bajon.

*-Bijî Şerê rizgariya neteweyiya GELÊ KURD !*

*-Bimre mêtingehparêzî !*

# Beng û Reng



# Wênekarekî kurdayî hêja li Parîsê

# REMZÎ

Wênekarê(ressamê) me yî hêja Remzî ev bûn bîst û pênc sal dengê kurdan di warê sen'et de dide bihîstin.Li cîkî weke Parîsê ku serbajar û nawenda(merkeza) sen'etkariya cihanê !

Remzî heta niha di galerî û muzeyên Fransayê de ji sîhî bêtir raberî(teşhîr)çêkiriye,wêneyên wî hatine hizkirin,ecibandin . Hawirên(mihîtên) sen'etkarî û rojnameyên frensizî,ji "Le Monde"ê heta kovarên wênekaran,wî rewayê pesindanê dîtine(binhêre kêlekê)Wêneyên wî ketine kolleksiyonên Fransa,Amerîka,Swîsre û hin welatên din

Wênekarê me yî hêja di 1928a ji diya xwe bûye li Kirikhanê(Kurdistana Tirkiyê).Piştî xwendina Akademiya Sen'etên Bedewên Stenbolê di 1953an de hatiye li Parîsê cîwar bûye.Jiber xebata wî ya kurdîtî,Tirkiye wî ji tabiiyeta xwe avêtiye,lê dinya bîrewer û şehreza wî kiriye nav rêzên xwe.

**Le Monde**

Le mérite de Remzi (4), exilé kurde ...venu parisien et peintre depuis un ... de siècle, est d'avoir refusé aussi ...ute concession à son folklore ...'aux tendances et aux engoue- ...l continue à avoir le spec- ...eux. Pour nous, il peut ...onnel, mais sa manière ... propres traditions.

LE FIGARO — MARDI 24 JANVIER 1978

**Remzi, peintre kurde**

Sobriété, tell... res... sion première d... les toiles de Remzi. ...e les montagnes de l... n fauteuil ou un buf... dans des petits ou ...

**Remzi.** Un Kurde de Paris

LE QUOTIDIEN DE PARIS

**Remzi : une Drôme devenue kurde**

● Un peintre kurde, étudiant puis réfugié politique à Paris.

## ji sovyetistanê name

Têmûrê Xelîl
Bendnvîsê rojnama kurdî "Riya Teze"

### Zana û kurdînasê sovyetiyê

# Prof. H. CİNDÎ



Meha adara 1978 a xitim bû heftê saliya bûyîna zana, nvîskar û mamostayê kurdayê bi nav û deng, Heciyê Cindî Cewarî.

Navê xebatkarê Instîtûta Rohelatnasiyê ya Akademiya Ermenîstanê yê Zanistiyan(Ulman), kurdîzan, doktor, profesor H.Cindî çawa li Yekîtiya Sovyetiyê wisa jî li sînorê wê dernaskirî ye. Ew xwedanê ji sedî bêtir xebatên zanistî(ulmî), pirtûkên (kitêbên) dersa, serhatî, folklor, metelok û gotinokên kurdî ye. Ewî nvîsîne pirtûkên gelek giranbiha wekî "Zmanzaniya kurdî"(sala 1935a) "Folklora Kurmanca"(sala 1936 a, tevî Emînê Evdal). Divê bê gotinê: gava Sermiyanê Komara Kurdistanê(Mehabadê) Qazî Mihemed ev pirtûk xwend, got: "Ev e quriyana me!"

Di rêza xebatên wî de: "Eposa(çîrçîroka) Kerr û Kullikê Silêment Silîvî"(1941), "Folklora Kurdî"(1957), sê dîwanên "Çîrokêd Milletê Kurd", "Serhatiyêd Cimaeta Kurda"(1959), "Eposa Rustemê Zal"(1977)û gelekê din. Gelek xebatê wî hatine wergerandinê zmanê ermenî, rûsî, azerî û hin zmanên din.

Mamosteyê mezin niha jî bi kel û bîn bo gelê(xelkê) xwe kar dike. Ev sal ewê pirtûka wiye"Gotin û Gotinokêd Kurda"(30.000 gotin)derkeve, du dîwanêd(yên IV û V)"Çîrokêd Kurdî" wê derên rûyê dinyayê.

Derveyî karê nvîskariyê, Prof. Heciyê Cindî xebatên din jî bicihaniye ûtîne: Serekê Yekîtiya Nvîskarên Ermenistana Sovyetî; Serekê Koma Akademiya Ermenistanê ya Kurdnasiyê, katibê rojnama kurdî "Riya Teze" Ewî di gelek gundên Kurda de dersên kurdî daye, gelek şagirtên wî bûne merivên eyan û navdar.

Ji ber vê xebata hêja li ser wêje(edebiyat), dîrok(tarîx), zmannasî û milletnasiya kurdî ewî gelek medelye, perû û nîşan rewa kiriye û hatiye perû kirin. Ew pir caran tevî xebata Kongra Nvîskarên Sovyetiyê bûye, depûtatê(gizîrê) ŞêwraErmenistanê yaBilind hatiye bijartinê. Navê "Xebatkarê ErmenistanêyîZanistiyê Sereke"dane wî, bi sê pesinnameyên Şêwra Ermenistanêye Bilind rewa bûye. Vançendên dawî ew layiqî nîşana mezin- ya Dostaniya Xelkan hate dîtin. Xizmeteke mezinê Prof.H.Cindî ew e ku bi rênîşan û zanayiya xwe endamên mala xwe jî daye ser riya pêşvebirina çanda(kûltûra) kurdî.

Dota wî, Nûra Cewarî bi mûsîkiya kurdî mijûl dibe, gelek pirtûkên wê hene le ser stranên kurdî; ew bixwe doktora sen'etkariyê ye. Zavên wî Şekroyê Miho doktorê dîrokê ye, Ehmedê Gogê berpirsiyarekî Radya Erîwanê ye; Tosinê Reşîd û Fêrîkê Usiv helbestvanên kurdayî navdar in.

# ZMAN

# Ferhengok

Zmanê xelkêyê rengîn û zengîn, kurdî hê ne bûye zmanekî zanistî;dewlemendîn û pêşvebirina wê divê.Her wekî ku kêm tê xwendin,di xwendegehan de nayê hînkirin têde cihêbûnên zaravan hene.Lewra bi kurdî bendên siyasî nvîsandin û xwendîn,di destpêkê de çîçik dijwar xuya ye.Hin gotinên ku di bendên me de hatine bikaranîn heye ku ji hin xwendevanan ve nenas bin.*FERHENGOK* ajêrîn jibo wan e.Gotinên kurdî bi wergerandina tirkî(t) û fransizî(f) hatine dayî.

Aborî,*(t):iktisat;(f):économie*
Alan ,*eksa deng;(t):yankı*
*(f):écho*
Azadî,*(t):özgürlük;(f):liberté*
Bend ,*(t):makale;(f):article*
Beng ,*(t):görüntü;(f):image*
Berpirsiyar,*(t):sorumlu;(f):responsable*
Bikaranîn,*(t):kullanmak;(f):employer,utiliser*
Bûyer,*(t):olay;(f):évènement*
Cihêbûn,*(t):fark;(f):différence*
*cihê,(t):ayri;(f)différent*
Cihêreng,*(t):degişik;(f):divers*
Çand ,*(t):kültür;(f):culture*
*çandî:(t)kültürel;(f)culturel*
Daxuyanî,*(t)beyanname,manifesto*
*(f):manifeste*
*daxuyanîn:(t):gösteri yapmak*
*(f):manifester;se*
Enî,*(t):cephe;(f):front*
Gel,*(t):halk;(f):peuple*
Giring,*(t):önemli;(f)important*
Girse ,*(t):kitle;(f):masse*
Giştî ,*(t):genel;(f):général*
Hevdesazî,*(t):örgüt;(f):organisation*
*Hevdesazîn(hevde sazkirin )*
*(t)örgütlemek;(f):organiser*

( dûmahîk heye)

# Elfabe

Ji salên 1930an bivir de zmanê kurdê bi tîpên(herfên)latînî tê nvîsandin.Elfabeya latînî xweş li zmanê me tê û ewê bêgûman bibe ya hemî Kurdan.Lê niha jiber sedemên cihêreng piraniya Kurdên Iran û Iraqê tîpên erebî,yên Sovyetistanê jî tîpên rûsî bikartînin.Jibo agahdariya xwendevanan va ne ev her sê elfabe.

| *Latîni* | *Rûsî* | *Erebî* | *Latînî* | *Rûsî* | *Erebî* |
|---|---|---|---|---|---|
| A | А | ا، آ، ع | N | Н | ن |
| B | Б | ب | O | О | ۆ |
| C | Щ | ج | P | П | پ |
| Ç | Ч | چ | Q | Q | ق |
| D | Д | د، ض | R | Р | ر |
| E | Ә | ا، ە، ـَ، ع | S | С | س، ص، ث |
| Ê | Е | ێ، يـ، ى، ع | Ş | Ш | ش |
| F | Ф | ف | T | Т | ت، ط |
| G | Г | گ | U | Ӧ | ـُ، و |
| H | N | ه، ح | Û | У | و |
| I | Ь | إ، ـِ، يـ، ى، ع | V | В | ڤ |
| Î | И | إ، ي، ى | W | W | و |
| J | Ж | ژ | X | X | خ، غ |
| K | К | ك | Y | Й | ـِ، ى |
| L | Л | ل | Z | З | ز، ذ، ض، ظ |
| M | М | م | | | |

**KURDÎ BİXWÎNE, HÎN BİBE, HÎN BİKE!..**

# * Stran û Leylan * *

ÇAÇANÊ




Yaxû yeman Çaçanê, 2)
H'imra beyda quysanê,
Çaço dîbê li zer bîrê,
Av k'işandî bi zincîrê,
Zincîr qetya k'et bîrê,
Destê xwe destê Çaço kim,
Bifevînim bavêm welatê Cizîrê.

Yaxû yeman Çaçanê,
H'imra beyda quysanê,
Çaço dîbû li ser dik'ê,
Av k'işandî bi e'lbikê,
Zincîr qetya k'et dik'ê,
Destê xwe destê Çaço kim,
Bifevînim bavêm welatê Dêrikê.

## MÛSÎKÎYA KURDÎ

AZADI,jibo qenc nasîna mûsîkiya kurdî sêlik(plak) û kasetên hiqalîte bidest dixe,dadigre û difroşe.Ji niha ve hun dikarin yên li jêrê binavkirî ji me bixwazin.

-Sêlika kurdî

*Musique Populaire du Kurdistan (Mûsîkiya Gelerî ya Kurdistanê)*
*Chants d'Amour-Stranên Evînê*
*Distirên:Aramê Tîgran,Aslîka Qadir,Gerabêtê Xaço,Şeroyê Bro, Temo,Zadîna Şekir,hwd..*
*33aer; 7 Dollar US(şandin têde)*

-Kaset

*°Aramê Tîgran,dengbêj û sazbend*
*°Folklora kurdî*
*1-Klamên Siyaran(yên şeran) Gerabêtê Xaço,Ş.Bro û ên din,*
*2-Klamên Dilan(yên Evînê)*
*3-Blûr û dûdûk(meqamên kurdî) Xecê û Siyamend,Bavê Seyro,.*
*60 deqîqe;4 Dollar(şandin têde)*

KURDISTAN



Hejmara ku tê:
*-Ji Daxuyaniya Partiya Komunîst*
*-Ji Bingehên destpêkiyên felsefê*
*-Li ser şerê hindurê Kurdên Iraqê*
*-Pirsa AKSA yê*
*-Xebata Yekitiya Xwendekarên Kurdistanê li Fransa*
*-Ji Dîroka Kurdistanê,hwd..hwd..*


A Z A D Î
Kovara siyasî û çandî ya kurdî
*Bi alîkariya komekî xebatkar û Xwendekarên Kurd derdikeve.Bi tu partî û hevdesaziyên tu perçeyekî Kurdistanê ve negirêdayî ye .*
Berpirsiyarê giştî: K e n d a l
Berpirsiyarê malhebûnê:H.KARACA
Nvîsekarî :E B D O
Navnîşan :c/o Nezan,B.P. 378
75625 PARIS CEDEX 13
France
Biha:*5FF/ 1Dollar/2,5DM/ 5SK*
(Pere li ser navê H.Karaca bişînin)


**KURDİSTANA AZA, YEKBÛYÎ, SOSYALÎST !**